



Şefafsazî digel “hîç”

»»» R:4



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftinamêyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (337)06-11-2018 Buha (1000) Tûmen

Dorpêçên giran, encama kiryarên rayedarên terorîst


Seş mehan piştî biryara “Donald Trump” derheq vekişiyana ji Bercemê, gera duyem a tehrîman ku bi “tehrîmên herî giran” naskirî ye, dest pê kiriye, û rewşa rejîmê ji pêştir aloztir kiriye.

Gera duyem a tehrîmên Amerîkayê li dijî Komara Îslamî ku di nîveşeva Yeksemiyê rêkefta 13`ê Xezelwerê bi dema Waşingtonê çûne qonaxa cîbicîkirinê, pêk hatine ji pîşesaziya neft, gemîvanî, xizmetên bîme, beşa enerjî û danûstandinên bankî.

“Donald Trump” di vê derheqê de ragehand: “Ew tehrîmane ku wekî tehrîma duyem jî hatine binavkirin, gelek giran in, ew dorpêç, dorpêçên herî tund in, ku heya niha me cîbicî kirine, û em dibînin ku çî rû dide, rewşa rejîma Tehranê baş nine”.

Hevdem “Mike Pompeo” Wezîrê Derve yê Amerîkayê di gotûbêjekê de digel “Fox News”ê ragehand: “Em di hewl de ne, ku digel piştevanîkirin ji xelkê Îranê ku hê-jayî jiyanê baş in, Komara Îslamî neçar bikin dest ji siyaseta têkderane bikêşe, eva armanca me ye, û erk û wezîfeyek e ku ji aliyê serok ve bi me hatiye dan”.

Gotiye jî: “Ev gera tehrîman piştî rejîmê dişkîne, heya ku bi vî awayî nekare, ku piştevanî ji terorîzmê bike, heya niha me kariye rêjeya hinardekirina nefta wê bo 1 mily-onî di rojekê de kêmkirin, ji niha şûnda kêmtir jî dibe, û bi bawerîya me, hemû cîhan ji vê rastiyê hesiyane, ku bi sedema siyasatên me, ne tenê reh û rîşeya vegeşiyana terorîzmê ji aliyê Komara Îslamî ve hişîk dibe, derfeteke baş jî bo xelkê



Îran pêk tîne, da ku wan guherînên ku dixwazin encam bidin”.


“Mike Pompeo” di “twitt”ekê de jî, bi boneya 39.mîn salvegera dagîrkirina balyozxaneya Amerîkayê ji aliyê tundajoyên ser bi rejîmê li Tehranê ragehand ku bîranîna bidîlgirtina 50 kes ji hevkarên me, bo heyama 444 rojan, me pêdagirtir dike li ser berdewamiya me, bona vê ku rjîma Îranê bêxin qedeman.

Destpêka gera duyem a tehrîman, komek dijkiyar lê ketine, ku bi kurtî bi vî awayî ne: “Avigdor Lieberman” Wezîrê Derve yê Bergirî ya Îsrailê di “twitt”ekê de destxweşî ji serokê Amerîkayê kiriye, û gotiye: “Ev karê rêzdar “Donald Trump” derbekî giran li Komara Îslamî dide”.

»»» R:6

**Danûstandi-
na siyasî yan
jî siyaseta
danûstand-
inê!**

»»» R:6



Xelk rehîne destên cellad in

»»» R:2

Sergotar**Xelk rehînê
destên cellad in****N: Kerîm Perwîzî**

Di hemberî siyaseta serkut-karane û tawanbarane ya rejîmê û deshilatên stemkar de, tenê rê serhildan û dijberiya hemû rûçik û biyavên deshilat nerewa ye, jiber ku ew cure deshilat karekî ku dikin, yan bixwe xelkê serkut dikin, û ji nav dibin, yan xelkê wekî rehîn digrin, bona berdwamiya rejîma xwe.

Komara Îslamî ku bi salan e serberedayîti û tevdanîkariyan dike, wekî hertim di pêxema mana rejîma xwe de, û bona belavbûn û rehdakutana terorîstane bo hemû cihekî navçeyê, hemû nirxekê bi ser xelkê din de disepîne, û amade ye ku xelkê bike qurbanîyê siyas-etên xwe ên şaş.

Piştî rêkktina Bercamê der-feteke din bi rejîma Îranê hate dan, ku hêdî-hêdî xwe digel cîhanê rêk bixe, û berev rejîmeke normal pêngavan bavêje. Re-jîmeke normal ku hem rêzê ji yasa û pîrensîpên cîhanî bigre, û hem jî hewl bide ku ji derfetan bona vegeşiyana welat û jiyana baştir a xelkê mifahê wergire, lê herwek ku me dizanî, û hatibû pêşbînîkirin, rejîmeke îdeolojîk û pawanxwaz û zêdexwaz wekî rejîma Îranê, van cure rêkvevtinan ne tenê bo geşekirina welat, belku bona vegeşandina terorîzmê û şerxwaziyan bi kar tîne. Ew pêngav bûye sedema cardin vegeşiyana dorpêçan li ser rejîma Îranê û aboriya wêran ya welat ber bi wêraniya zêdetir ve pênga-van davêje.

Lê di vê navberê de, wekî hertim neteweyên Îranê û xelkê akinciyê welatekî belalêdayî wekî Îranê ne, ku dibin qurbanîyê siyaseta pawanxwazane û serberedayiyane ya rejîma zal bi ser Îranê de.

Ruhaniyê serkomarê rejîma Îranê, piştî vegeşiyana hemû dorpêçan li ser rejîma Îranê, di roja 14'ê

Şandeke PDKÎ û şanda Hizba Sosyal Demokrat a Swîdê bi hev re hevdîtinek pêk anîn



Komeke mijarên pêwendîdar bi tevgera Kurd li Rojhilata Kurdistanê û siyaseta komkujiya sistematîk a Kurdan ji aliyê rejîma Îranê ve, digel şanda Hizba Sosyal Demokrat a Swîdê gotûbêj li ser hat kirin.

Roja Sêşemiyê 8'ê Xezelwera 1397'an a Rojî, şandeke PDKÎ bi serperestiya Mihemednezîf Qadirî cihgirê duyem ê Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ di hevdîtinekê de digel Heyeta Hizba Sosyal Demokrat a Swîdê pêkhatî ji "Evîn Încî" cihgira berpirsê pêwendiyên navdewletî, "Samî Mayşîl" berdevka Wezaretê Enerjiyê bo hevahengî-ya siyasî û "Sana Îlyason" berpirsa pirojeyên Rojhilata Navîn û başûra Amerîkayê li dezgeha Olaf Palme, ku bo hinek hevdîtinan digel çend hizbên Kurdistanê hatibûne Herêma Kurdistanê, ronahî xistin ser komeke mijarên pêwendîdar bi tevgera Kurd li Rojhilata Kurdistanê, û siyaseta komkujiya sistematîk a Kurdan ji aliyê rejîma Îranê ve.

Di vê hevdîtînê de Mihemednezîf Qadirî pêdagirî kir li ser vê ku, derheq vê rewşa nebaş de ku rejîma Îranê bo Kurdan pêk aniye, û berdwam dirêjî daye kiryarên terorîstî di navxwe û li derve bona jinavbirina cudahizran û dijberan, pêwîst e ku Sosyal Demokratên Ewropayê, û ew hêz û aliyên ku bawerî bi demokrasî û mafê mirovan, û aramiyê hene, piştevanîyê ji xebata cemawerî û medenî ya xelkê Rojhilata Kurdistanê bikin, bona gihîştina bi mafên neteweyî û kerameta mirovî.

Her di vê derheqê de, cihgirê duyem ê Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ komeke dekomment û zanyariyên hewce derheq bînpêkariyên dijîmîrovî ên rejîma Komara Îslamî ya Îranê radestî şanda Partiya Sosyal Demokrat kirin.



Xezelwerê de, dibêje ku ew dorpêç tenê zextê dixin ser xelkê, û zext û givaşê bo çî tişteke din nahînin!. Ew gotin her çend ku hinek tiştên nerast tê de ne, û vegeşiyana dorpêçan perê destên rejîma terorîst û Spaha Pas-daran a terorîst kêmkirî dike, û wan bêhêz dike, lê nişana felsefeyeke tawanb arane ya rejîma Îslamiya Îranê ye! Di hemû cîhana azad û civaka mirovahiyê de, dema ku kirîzek berbirûyê welat dibe, deshilatdar û xwedîpêgehên welat hemû nirxekê ji xwe û ji hêza leşkerî ya xwe dadinên, da ku kirîz derbaz be, û xelk bigihîjin asûdeyiyê. Lê di rejîmeke wekî deshilat dasepayî ya Tehranê de, serkomarê vê rejîmê bi ew qasê bêşermî ve, vê yekê qebûl dike, ku xelk wekî rehîn girtine, û hindî ku zextê bo rejîmê binin, ew jî xelkê dikin mertala belayan, û wekî rehînekê rû li cîhanê, dibêjin ku ger zextê bixin ser me, xelk wê bê êşandin!

Ew yek rast e ku dorpêç ji nan û sivka Xamineyî û Rûhanî û tawanbarên din yê wê rejîmê kêmkirî, lê hemû kiryar û pêngav û siyasatên wan zêdetir diselimînin ku ew rejîma, ne tenê deshilateke îdarekirina welat nine, belku bandeke mafyayî û terorîstî ne, ku neteweyên Îranê wekî rehîn girtine, û dibe ku bi her awayekî bibe, hewl bo rizgarkirina rehînan ji destên mafyaya Komara Îslamî de bidin.

Bajar çavkaniya tekoşîn û piştevanê serekî ê “Rasan”ê ye



N: Elborz Ro'nten

Pêşgotin

“Rasan”ê îro kariye bibe formoleke girîng bo rizgarî, û ya ku kariye cudahiya “Rasan”ê û formolbûna bo serdema niha derbixe, hebûna gotareke giştîgîr e bo xebatê, ku pêşmerge beşek yan aliyekî vê xebatê ye, û aliyê din li jêr navê xebata bajar de xwe derdixe.

Serxistina “Rasan”ê jî girêdayî ye bi bihêzkirina xebata bajar û pêkvegêrdana wê digel xebata çiya. Ji vê dîtingehê ve şirovekirina xebata bajar û girîngîpêdana bi wê, di biyavê piraktîkê de wekî hewcehiyeke haşahilnegir tê hesibandin. Di heman demê de, ew şirove dibe bête birin bo nav xelkê, da ku di encamdana her çalakiyekê de, tevî xatircemiya xwe, wê wekî beşek ji xebata giştîgîr bizane. Xwe wekî beşekzanîn ji xebtekê bi navê “Rasan”ê jî aliyê xelkê ve, dibe sedema vegeşandina vê birokeyê, ku bedîla hikûmeta nerewa û dagîrker hebûneke bihêz e. Di vê nivîsê de emê îşarê bikin bi girîngiya bajar û şiroveyekê bo vê biyava xebatê, û çawanîya vegeşandina wê, wekî stûna sereke ya serkevtina “Rasan”ê. Herweha bixwe ve girtina aliyekî weha girîng jî di çarçoveya “Rasan”ê bixwe de, selmînerê vê rastiye ye, ku “Rasan” şoreşeke serdemiyane ya rewşa Kurd e li Rojhilat, ku wekî hêzeke bibandor dikare gel ber bi serkevtinê ve bibe.

Bajar

Bajar wekî cihê jiyana nifûseke zaf ji xelkê ku tê de akincî ne, û herweha wekî navenda hukimraniyê tê hesibandin. Dema ku bas ji deshilatdariyê tê kirin, rasterast pêwendîya siyasî û bajar derdikeve, û bajar hertim digel têgeha siyasî pêwendî hebûye.

Pêdeçûna bi peyvnasiya bajar di serdemên cuda de, vê rastiye nîşan dide ku hemû peyvên ku bo gotina bajar bi kar tên anîn, bi awayekî ku pêdagirî li ser rêxistin, şaristaniyet, hikûmet û sertirbûna çînek yan texeke civakê

dike, ji aliyekî din ve jî, peyva siyasî (politics) ji peyva Yonânî ya (Polis) bi watayê bajar e. Di rastî de wateya siyasî di Yonânî de zanista bajar e, û di vî warî de hinek ji zanayan navê zanista bajar jî li ser siyasî danîne”.¹ Bêguman bi vê pênaseyê û têkelawîya bajar û siyasî, girîngiya vê navendê di xebata me ê Kurd de, zêdetir derdixe. Heta nîşan dide ku şahrega xebata me di rabûna bajar de ye.

Dema ku em li amara bajarnîşîniyê di Îranê de dinêrin, girîngiya vê mijarê zêdetir xwe eyan û eşkere dike. “Rêjeya bajarnîşîniyê di welat de %74 e, ku ew hejmar di sala 1390’î de, %71 bûye”.²

Bi vê amarê û pênaseyê eşkere dibe ku şoreşek bi hebûn û rabûna bajar hêsantir serdikeve, û xerçeke kêmtir radike, jiber ku xebata bajar dilê deshilatdariya nerewa dike.

Ne tenê siyasî û hukimranî, belku bajar pêwendîya wê bi hemû biyavên jiyanê û zanista mirovî bi awayekî rasterast heye. Hekî bo zanista civaknasiyê pîrsa serekî xwendina reftara civakî ya kesên di rewşên cuda de be, eva bajar cihê van reftaran ji biyavên cuda bo girûpên cuda ye”.³ Bi heman şeweyî di warê aborî, nifûs û gellek mijarên din bajar bi navendeke girîng tê hesibandin. Hekî em bixwazin şoreşekê bi rê ve bibin, me hewcehî bi vê heye, ku navendeke wisa girîng bikin çeqa xebata xwe, ku çeqa piraniya leyîzên jiyanê ye, jiber ku şoreşa me rasterast yan nerasterast pey-



wendî heye bi hemû van mijaran ve.

Bo mînak hekî rewşa aborî dibe sedema nerazîbûnan, eva bajar dibin çeqa derketina van nerazîbûnan, û wê demê xebata bajar girîngiya xwe nîşan dide, û pêşkevtina “Rasan”ê, vedigere bo hilgirtina vê diruşmê, û karkirina di piraktîkê de bo vê xebatê xwe nîşan dide.

Girîngiya bajar di cemawerîkirina xebatê de

Yek ji bingehtirîn sedemên serkevtina her şoreşekê bi cemawerîkirina wê ye, wate serkevtina wê girêdayî ye bi vê ku çende dikarin vê şoreşê û armancên wê bibin nav xelkê de. Ew mijar bo wan hêzên ku hêza serekî ya xwe ji xelkê werdigrin, û şoreşê bi rê ve dibin, girîngiyeke zaf heye. Dijmin jî bona rêgirîkirina ji vê mijarê gellek hewl dide bona vê ku pêşîya cemawerîkirina şoreşê bigre. Heta ew xercê zêde ku bona çewtekirina rastiyan derheq PDKÎ bi kar tîne, bi armanca kêmkirina pêgeha hizbê ye di nav xelkê de, da ku ji vê riyê ve rêgiriye bike ji bicemawerîkirina xebatê. Metirsiyeke din bikaranîna torên civakî û wêbsaytan, wekî emraza serdem ji aliyê dijmin ve bo vê armancê ye. “Rasan” di demeke weha de ku bi hemû awayekî hewla berdewam ya stem û çewtekariyan dide, diruşma xebata çiya û bajar ragehand. Xebatke çendalî, ku bikare cardin şoreşê bibe nav xelkê de. Ji aliyekî din ve jî pûçkirina hemû hewlên dijmin bû derheq şoreşê û bi taybetî PDKÎ, jiber ku di demekê de ku dijmin bi pîlanên zêde

rêgirî dikir ji bicemawerîkirina xebatê, “Rasan” felsefeya parvekirina erka şoreşê bi ser hemiyan de kire bernameya karê xwe, bi heman awayî ku pêşmerge qehremantiyê ji xwe nîşan dide, dibe xelk jî bajar bihejîne, da ku hemû dest di nav destên hevdu xebatê ber bi serkevtinê ve bibin.

Bo mijareke weha bicemawerîkirina xebatê bingehek e, û bo cemawerîkirina xebatê jî hewce ye ku navendeke girîng ya jiyanê û heşîmetê wekî bajar bike çeqa xebat bo vê ku armanca xwe bipêke. Girîngîpêdana “Rasan”ê bi xebata bajar jî, di vê çarçoveyê de ye. Bajar tevî nifûsa zêde, ku bingeha cemawerîkirina xebatê ye, naven-da hukimraniya nerewa ya dijmin e jî, lewra jî rabûna di nav bajaran de, gurz û derbelêxistina li dilê dijmin e, ku dikare bi xerçeke kêmtir ku armanca “Rasan”ê ye, gel ber bi serkevtina zêdetir ve bibe. Lê eva ku çawa ew biyavê xebatê ber bi pêşve diçe, çend mijarên serekî hene, ku dibe berçav bêne girtin, û bi giştî di van xalan de tênê kurtkirin.

-Pêdeçûnek bi ser karê rêxistinê di bajaran de, bi armanca rêxistinê li gora taybetmendiya bajar.

-Pêwendîgirtina bi hemû wan rêxirawên nehişkî re, ku bandora rejîmê li ser wan nîne, û di biyavên cûrbicûr de kar dikin, bi armanca hevahengiya di dema hewce de.

-Parvekirina rêxistina bajaran, li gora pîşeyî û taybetmendi-yên pîşeyî, bona hevdengbûna

»»» Dom R:4



»»»» Doma R:3

wan di dema hewce de, û mifah-wergirtina ji wna bi awayê rêkxistinkirîtir.

-Çalakkirin û pêwendigirtina bi tevgerên xwendekarî re, jiber ku gellek caran zanko ku di navenda bajar de ne, dibin navend û dînamoya xebatê.

-Piştewankirin ji daxwazên pîşeyî û xistina ber çavan ya daxwazên giştî di wê demê de, yan jî di derfeta hewce de.

-Vegeşandina torên civakî bi armanca bandora li ser raya giştî û rêkxistina di dema hewce de, jiber ku mifahwergirtin ji van emrazan derfetek e ku bo şoreşê dikare gellek qazanc lê bihê dîtin, ku xerxeke kêr ya madî û canî heye.

-Hebûna ragehandineke bihêz ku bibe çavkaniyeke bawerpêkirî bo xelkê ku tu demê baweriya wan bi medyaya rejîmê nebûye. Girîngîdan bi van xalan û hin xalên din, dibe sedem ku bingehek ji bo xebata Bajar di peyva “Rasan”ê de pêk bê û bibe xwedî bandor. Wê demê wê Bajar bikare bi xwepêşandan, girevên giştî, têkbirina aramiya dujmin li bajaran û bi şewazên din ên lihem-berderketina dujmin, çalakiyên xwe berfirehtir jî bike. Ev çalakî jî wê bibin bingeha şoreşê giştî û wê bikarin destên xebatê bi aliyê Çiya ve dirêj bikin û di encam de bi pêwendiya di navbera Çiya û Bajar de, wê “Rasan” serkeve.

Pêşmergeyên Bajar

Peyva şoreşgêrane a Pêşmergeyên Bajar, piştî ragihandina “Rasan”ê ji bo cara yekemîn derket nava qada tevgera netewî a me de. Girîngiya wê jî ne tenê ev e ku peyva bajar pê re ye lêbelê bi vê sedemê ye ku xebata Bajar jî girîngiyeke zaf di vê tevgerê de heye. Pêkanîna hêzekê ji bo berevaniyê, pêwîstiya şoreş û serhildanê li hemberî rejîmeke dîktator a weke Komara Îslamî a Îranê ku tevahiya rêyên bê exlaqî û nemirovane bi kar tîne û dijatiya xwestekên netewa me dike. Pêkanîna vê hêzê jî weke berevanîkirin ji şoreş û xebatê û herwisa weke astengkirina dujmin tê binavkirin. Bi vê hêzê, êdî dujmin nikare zîyanê li serhildan û şoreşa me bide. Peyva pirwate a pêşmerge, berhema serdema Komara Kurdistanê û Pêşewayê Kurdan Qazî Mihemed e.

Pêşmerge di “Rasan”ê de tê wateya tevlîkirina naveroka wê di xebata me de ku heman herikandina hêza Bajar e. Herwisa di çarçoveya xebata pîralî a Bajar de, hebûna Pêşmergeyên Bajar, pêwîst, girîng û di vê rêbazê de gelek jî bi bandor e. Ruhê felsefeya pêşmergeyê di nav peyva Pêşmergeyên Bajar de ku bingeha cangorîtî ji bo niştîman e û rêbaza şehîdan tê de reng vedide, û tevî ku di jeografiya navxwe a Kurdistanê de ye, erkên şoreşê li bajaran bicî dike. Lewre dikare bi teknîk û rêkxistina taybet a xwe berfirehtir bibe û di bicîkirina erkên rasipartî de serkeftî be. Tevî ku ev demeke dirêj e Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bi girîngî li vê mijarê dinêre, lê divê

di bin ronahiya gotarên çarçoveya “Rasan”ê û rêkxistina taybet de bêne xurttirkirin û berfirehtirkirin. Rêberê nemir şehîd Dr. Qasimlo di derbarê girîngiya xebata Bajar de di gomareke dengî de dibêje: “Rejîm, bajarên Kurdistanê ji xwe re weke hêza parastina çeperan bi kar tîne û bi vê sedemê jî em dikarin li bajarên Kurdistanê, derbeyên bi bandor û giran li dujmin bidin.

Dujmin li bajaran her karekî encam bide, dixwaze pêgeha xwe û hêza parastina çeperên xwe xurt bike. Kelûpel û alavên xwe jî bajaran tîne û xwarinê jî ji wir tîne. Pêşmerge nabe tenê li dervey bajaran rê li ber dujmin bigirin û derbeyan li dujmin bidin lêbelê divê li nav bajaran jî tevlîheviyê çê bikin. Bi her şewazekî ku tê kirin, divê em vî karî encam bidin û di vê mijarê de jî xelkê Kurdistanê baş dîzanin bi çi awayekî û çawan derbeyan li dujmin bidin. Divê xelk bi ibtikara xwe, vê erkê li dijî dujmin bicî bikin. Nabe ji bîr bikin tevî ku ev li bajar dijîn û çekên wan tîne ne, lê ew bixwe jî pêşmerge ne û weke pêşmergeyan di çeperan de ne. Divê erkên xwe ji bo têkbirina pîlanên dujmin û ji bo gihandina nûçeyan bo çeperên pêşmergeyan û haydarkirina wan ji rewşê bicî bikin. Êdî divê ji bo astengkirina dujmin, bi her awayekî ku bi wan bê kirin, derbeyan li dujmin bidin.” Bi vê tomara dengî xuya dibe ku bajarên Kurdistanê ku navenda desthilatdariya nerewa a dujmin li Kurdistanê ne, navenda derbelêdana şoreşê ne. Lewma jî eger em bixwazin serkeftî bin, divê di warê serbazî de jî bajaran ji bîr nekin.

Kombend

Xebata Bajar, weke aliyekî “Rasan”ê, şewazên cuda ên xebatê lixwe digire û divê ji bo her yek ji wan şewazan, bername û pilaneke taybet bê danîn û jê re kar bê kirin.

Bi vî rengî, wê bajar bibe meydana çalakiya şoreşê û êdî dujmin nikare li ti cihekî ser axa dagirkirî a Kurdistanê, bi xewnên xwe ên xweş, dagirkariya xwe berdewam bike. Karê serdemiyane û pêşketî û herwisa girîngîdan bi peyama pêşketî a “Rasan”ê ji bo Bajar, dibin sedem ku ew rewş pêk bê û êdî jiyana rojane li Bajar, bi şoreşê re rengê hev bigirin. Tevî ku xelkê Kurdistanê ji tevahiya mafên netewî hatine bîparkirin û sistema Komara Îslamî bi dehan pirsgrêk ji wan re çê kirine. Ev xelk, êdî ji vî rewşê û ji ber pirsgrêkên aborî, civakî û siyasî din alin. Ev jî, ji bo hêzeke xwedîbandor a weke “Rasan”ê rê xweş dike û divê mifah jê were standin. Divê Bajar, ji bo dabînkirina azadî û mafên xwe û ji bo rizgarbûn ji tevahiya wan pîrsan ku bi mana desthilatdariya Komara Îslamî nayên çareserkirin, bibin beşeke sereke ji “Rasan”ê. Heya wê demê ku tev alî bi hev re gavên xurt ji bo serbestî û jiyanê xweş nerakin, serkeftin çê nabe.

Çavkanî:

- 1-“Tebyîne felsefî-mefhûmiyê coxrafiyayê siyasîyê şer”
- 2- Navenda serjimêriya Îranê
- 3-“Tebyîne felsefî-mefhûmiyê coxrafiyayê siyasîyê şer”

Şefafsazî digel “hîç”



Bextiyar Osmanî

Tirs, û zext û givaşan, Komara Îslamî tûşî pozbilindî û xwehilko-tanên dawiyê kiriye, çî di kiryar yan jî di gotarê de, eva çend sal in ku Xamineyî çirrtir û taybetîtir ji caran nesîhet û şîreta xelkê û bi taybetî kesên karbîdest û ayînî dike, rojekê bas ji “Bergirî”, rojeke din bas ji cîhad û ...hwd dike, û îro jî şefafsaziyê tîne gorê. Bêyê ve ku ew yek li ber çav bê girtin ku gelo pêşiya derketin û helatina rojê tê girtin?. Kê heya niha di nava şeva zîlmat û tarî ya stemê de, ronahî ditiye, heya ku em îro di nava vê deshîlata reş de çavniher bin?. Ew yek û dehan pirsên din, dibêjne me, ku ya ku Xamineyî wekî şîret bas dike, wekî toza banan, diçe û namîne.

Xamineyî di roja 23`ê Rezbera îsal de (hefteyekê piştê ew darsa wî hate belavkirin) di darsa “Dervey Fiqh” de ku di dersdanên hewzeyê de ya herî bilind e, bas ji şefafsaziyê dike, û wan şîret dike, ku dibe çîran çepên wan tunebin, wekî pişeya hertimî ya xwe hewl bidin, ku rast bin, wekî pişeya hertimî jî hewl dide ku her çî buha û yasa û têgehên erênî û mirovtewerane ye, vegerîne bo ayînzaya xwe, û sexera xelkê bibe, ku dibêjin van têgehên ji felsefe û zanista rojava fêr bûne. Di basa xwe de tê ser vê ku di çî pîrsekê de şefafsazî nehê kirin, û dibêje: “Di pirsên emniyetî de, di pirsên leşkerî de, di van pirsên ku digel dijmin di şer de ne, belê vir cihê eşkerîkirinê nine, cihê şefafsaziyê nine”.

Dema ku tu lê dinihêrî, da ku bizanî gelo pîrsek bo şefafsaziyê heye yan na? “Na”yeke mezin qît



dibe. Bona zelalkirina van bi-yavên ku Xamineyî îşarê pê dike, hinek teweran emê bas bikin. Di welatên pêşkevî de, şefafsazî sedemeke bihêz û bibandor e bona vê ku xelk ji qedera xwe agehdar bin. Di pirsên ewlehiyê de ew li gora hewceyiyê agehdarî erk û çalakîyên vî warî ne, û îznê nadin ku hewl bo tevdanîkariyan yan terorê li ser xelkê yan jî heta li ser xelkê dervey welat jî bihêdan, tiştê ku dezgehên ewlehiyê ên Komara Îslamî bi eşkere û bi awayekî berfireh derheq xelkê medenî yan çalakekî/e siyasî yan her dengeke nerazî bi rê ve dibin, û bi şanazî jî dizanin. Di rastî de, erk û wezîfeya li ser milên wan bûye eva ku, dengê wan di geveryê de bifetîşîn, û kuştara xelkê bikin û tu karekî wan li parastinê xelkê neketiye.

Di biyavê leşkerî de jî, Îran bo heyama du dehikan dibe ku di hewla veşartina bernameya navîkî de bû, û çalakîyên wê jî her hemû di xizmeta terorê, û destêwerdanê de bû, her hemû bijêwa xelkê kirin çek û teqemenî, û bedela spaheke nîştimanî û xelkî, spaheke terorîst û talanker pêk anîn.

Xamineyî dibêje di van meseleyan de ku em bi dijmin re di nav şer de ne, nabe ku em şefaf bin, wî bi zelalî warê emniyetî û leşkerî jê derkiriye, û dimîne warê aborî, siyasî, civakî, ku ew jî digel biyavên din ji hev nahêne cudakirin, û hemû jî bo xelkê hewce ne. Komara Îslamî her di destpêka hatina ser kar ya xwe de, digel cîhanê, xelkê Îranê û gelên azadîxwaz li şer de bûye,

û niha jî bas ji vê dike ku em di şerê aborî de ne digel Amerîkayê, lewra qisekirina li ser wê bive ye, û qedexa ye. Di siyasîyê wan de berjewendiya xelkê berçav nahê girtin, heya duh bû ku diruşma wan, ne Rojhilat û ne jî Rojava bû, heya banga vê yekê dikin ku em dibe pişt li Rojava û rû bi Rojhilat bin.

Siyaseteke dijminîkarane û durûyane derheq cîranan ku ew peyrew dikin. Di biyavê civakî de, heya niha bi zelalî tu amareke rast û cihê baweriyê li ser kêmasiyan û kirîzan nehatiye belavkirin, amara bêkarî, îtiyad, û ...hwd ku belav dikin gellek dûr in ji rastiyê, ew jî bi hêceta parastina ewlehiya neteweyî.

Heta hekî em wisa danên şefafsaziyek pêk bê, dibe em bipirsîn ku ji çî sekoyekê ve wê bêjin xelkê? Rojnameyêke azad û serbixwe tune, miqesa sansorê jî hertim tîj e, û dibiriqe. Wan jêve ye ku torên civakî hemû jî ser bi welatên biyanî û dijminên rejîmê ne! û hatine qedexa yan filterkirin, û televîzyon hatiye qorixkirin ji dest taqmeke daxistî de, zanko bi hêceta “nifûz”, ji ders û mamostayên baş û xelkî, hatiye bêparkirin, û bi giştî cihek nemaye da ku kêmekê jî şefafsazî bê kirin.

Cuda ji hemû evana, dema ku xelk rastî parvekirinên wekî “xweyî” û “biyanî” tê, armanca wan ji “xweyî”, taqmek deshîlatdarên rejîmê ne, ku di hemberî biyaniyan de ku heman xelk e, êdî tu kesek

Di çarçoveya deshîlata reş ya Komara Îslamî de, tu asoyek nahê dîtin.

namîne ku ew jê re baxivin. Her wekî ku em dibînin tu biyav yan cihek nemaye ku Xamineyî bi zelalî hêla sor bi ser de nekêşabe, da ku nişana pîrsê bixin ser, ji aliyekî din ve jî daxwaza şefafsaziyê dike, dibe ku em bêjin ku “te ku hemû hebûn û nebûneke welat xistiye bin lep û kursiyê xwe de, tu dibe şefaf bî, yan xelkê nedar û êxsîrkirî? Gelo ronakbîr yan çalakek bi kîjan zanyarî û bi kîjan seko yan bi çî parastîbûnekê ve, kirîzên welat bo xelkê şirove bike, dema ku bizane kuncê bendîxanê û kindirê sêdarê çavniheriya wî dike?”

Em digihîjin vê encamê ku Xamineyî tenê bona çewtekariyan û ragirtina xelkê, van qiseyên birîqedar dike. Hekî ne, di çarçoveya deshîlata reş ya Komara Îslamî de, tu asoyek nahê dîtin. Herwekî ku çawa heya niha her çî nîrx û buhayên mirovahiyê ye, xistine nav gorê de.

Danûstandina siyasî yan jî siyaseta danûstandinê!



Elî Soranî

Pênaseya herî naskirî û hêsan a peyva siyasetê, zanist û hunera mumkîn e ku ji bo rêveberiya civakê tê pêkanîn. Di vir de danûstandin û diyalog, weke bingehê xurt a civakê tê dîtin. Lêbelê ev bingeh jî hin pîrensîpan li xwe digire ku di danûstandina siyasî û siyaseta danûstandinê de reng vedidin. Carna bûyereke siyasî, destkeft yan jî rewşên cuda ku berhema siyasetê ne, gotûbêjê li pey xwe ve tînin. Ji bo mînak ew civînên ku li ser kirîza Sûriyê û bi tevîbûna welatên herêmî û hin welatên ji parzemînen din têne encamdan, encama bûyer yan jî derfetên siyasî ne ku tevahiya aliyên gotûbêjê dibin aliyê siyasî. Hin car jî welat yan aliyên cuda, ji bo bidestxistina armancên xwe siyaseta danûstandinê bi kar tînin.

Mînak jî ew danûstandin in ku ji bo pêkanîna eniyê hepar yan jî hevpeymaniyekê têne encamdan. Gelek caran dujminên neteweya Kurd, danûstandinê weke karteke siyasî û herwisa bikuj li hemberî Kurdistan bi kar tînin û ev siyaseta jî li hemû perçeyên Kurdistanê di danûstandinê de tê dîtin. Bi taybetî desthilatdarên Îranê çî Şah yan jî axund, ew weke pîlanek bi kar anîna da ku derbeyê li tevgera



Kurdan bidin. Simayîl Axayê Simko bi pîlana danûstandinê hate şehîdkirin, şehîd Dr. Qasimlo û şehîd Dr. Şerefkendî jî bi heman pîlanê hatin şehîdkirin. Lemwa jî pêwîstiya danûstandinê, armanc û sedemên wê ji me re zelal dike. Armanc ji vê nivîsê ev e ku em bizanin weke Kurdên Kurdistanê Rojhilat ku axa me jî hatiye dagirkirin, me gelek derbeyên giran bi hênceta danûstandinê ji rejîmên dagirkar dîtine. Gelo emê bikarin ji bo çareseriyê pîrgirêkan û ji bo dabînkirina xwestekên xwe careke din piştî xwe bi diyalog û gotûbêjê germ bikin?! Gelo ew dujminên ku hewla wan a sereke, tînekirin û asîmîlekirina neteweya me ye, amade dibin di riya aşîtiyê re xwestekên me bicî bikin?!

Ew heman rejîm in ku hemû riyan ji bo komkujkirin û jinavbirina me bi kar tînin û meirîfeta cewherî a wan û pêkhate û hebûna wan,



Me gelek derbeyên giran bi hênceta danûstandinê ji rejîmên dagirkar xwarine

înkarkirina me û binavkirina hemûyan weke ummet e û zimanê wan jî tenê zimanê kuştinê ye. Eger em bala xwe bidin dîroka danûstandinê di navbera Kurdistan û dujminên wan de, ji me re xuya dibe ku herî kêmtir di vî sistemê de bawerî bi danûstandinê tê wateya bilqên ser avê.

Rejîmek ku ji destpêkê ve ve li ser bingeha dijatiya demokrasî û wekheviya civakî û netewî hatiye avakirina, ti caran nikare rê ji bo gotûbêj û danûstandineke aşîtxwaziyê xweş bike û tenê danûstandinê ji bo derbaskirina dem û jinavbirina derfetan û ji bo derbelêdana dijberên xwe bi kar tîne. Têvî ku di hemû qonaxan de û bi derfetên cuda, çavên Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê weke pîrensîpeke demokratîk li danûstandin û gotûbêjan bûne û hertim amade bûye ku ji vî faktera demokratîk ji bo pêşxistina bernameyên xwe mifahîst bistîne, lê dîroka tal a danûstandinê bi hikûmetên cuda ên Îranê re, dibe sedem ku êdî bi baldarî li vî mijarê binêre. Eger jî gotûbêj li welatê sêyem û bi çavdêriya civaka navdewletî bêne encamdan, wê demê hêvî zêdetir dibin.

Lêbelê ev jî tenê di demekê de çê dibe ku Komara Îslamî rastî vekirîbûn û guhertinê hatibe û êdî danûstandin û diyalogê ji bo armancên xwe ên ehrîmenî bi kar nebe. Eger em bala xwe bidin mahiyet û bingeha vala a Komara Îslamî, xuya dibe ku eger rejîm vî danûstandinê jî qebûl bike, dixwaze welatên rojava û navçeyê ji givaşan poşman bike lê di rastî de ti caran Kurd nikarin di vî rîyê de tiştekê bi dest bixînin û nikare ekter be û wê leyîzeke siyasî bi wan re bê kirin.

de deynê me yê derekî gellek kêmtir e, û heyiyên dewletê gellek zor in, û dikarin bêjim ku em dewleteke dewlemend in".

Eva jî di demekê de ye ku tehrîm bûne sedema daketina berçav ya perê Îranê, û şikestxwarina pîraniya beşên pişesazî, û xelk heta bo dabînkirina "Pûşak"ên zarokên xwe jî bêçare mane, ew rewşa jî bûye sedema vî ku Wilayetî neçar be, daxwazê ji xelkê bike ku wekî Yemeniyên bijîn, û bedela lixwekirina cilûbergan, pîneyekê navtenga xwe bialînin, û çinikan

bixwin.

Hevdem Wezîrê Xizînedariyê yê Amerîkayê, paş destpêkirina fermî ya dorpêçên vî welatî li dijî rejîma Îranê, di rojnameya "The Financial Times" de nivîsandiye: "Amerîka zexta zêdetir bo girêdana Îranê bi hewce dizane".

Bi giştî bi sedema rewşa zal bi ser Îranê de, ku beşa sereke ya wê, bi sedema birêveberiya kêrnehatî û siyasîyên şaş û dijminîkane ên rejîma Tehranê ne, karnas û çavdêrên siyasî dûredîmeneke gellek şêlû û bidûman bo Îranê pêşbînî dikin, ku derfeta jiyanê tê de djiwar û diwartir dibe, heta hinek ji wan li ser vî baweriyê ne ku axavtînen Rûhanî û serkirdeyên Komara Îslamî tenê bo parastina rewaya xeyalî ya wan bixwe ye, û dawî car her bixwe neçar dibin ku serî bo xwestekên Amerîkayê û civaka cîhanî bitewînin, û tasa jehreke din fir kin, tenê bi vî ferq û cudahiyê, ku ew tasa jehrê, wê serê wan bixwe.

»»» Doma mansetê

Hesen Rohanî serkomarê rejîmê jî di civînekê de li Werzaretê Aborî de gotiye: "Bi şanazî ve em tehrîman dişkinin"! Gotiye jî: "Tehrîman alîkar bûn bo bazara sermaye". Her di vî derheqê de û di axavtîneke ecêb de, Cehangîrî cihgirê yekem ê Rûhanî ragehandiye: "Em dewletek in ku di rewşa niha

Nerîna Lîderan



Trump::

“Naxwazim bi cezakirina sektora petrola Îranê, bihayê wê li cîhanê bilind bikim”.



Mike Pompeo:

“Destên Qasim Silêmanî bi xwînê sor e, dibe ku em piştewaniya rejîma Îranê ji milîşan ragirin”.



John Bolton:

“Cezayên din bo ser Îranê hene û pir tund in”.



Brian H. Hook:

“Amerîkayê pilaneke binecî ji bo dijberiya digel çalakiyê terorîstî ên Îranê heye”.

“KMMK-G”ê di nameyekê de bo “Cawîd Rehman” pêdagirî li ser bêsûçbûna Hidayet Ebdullahpûr kir

Komela Mafê Mirovan a Kurdistana Îranê-“Genev”, di nameyekê de, bo reportêrê taybet yê saziya NY yê derheq karê mafê mirovan a Îranê de, rewşa Hidayet Ebdullahpûr girtiye siyasî yê Kurd yê mehkûm bi îdamê, şirove kir.

Komela Mafê Mirovan a Kurdistana Îranê-“Genev”, derheq rewşa Hidayet Ebdullahpûr girtiye siyasî yê Kurd ku cezaya bidarvekirinê bi ser de hatiye sepandin, di girtîgeha navendî ya bajarê Urmiyê de, bo “Cawîd Rehman” reportêrê taybet yê saziya NY yê di karê mafê mirovan a Îranê de nameyek şand.

Wê navenda mafê mirovan, di vê nameyê de îşare bi vê tohmet kiriye, ku xistine stûyê girtiye siyasî yê Kurd yê mehkûm bi cezaya îdamê.

Komela Mafê Mirovan a Kurdistana Îranê-“Genev”, li gorî gotina Hidayet Ebdullahpûr, û parêzerê dosiyeya wî ragehandiye ku, tohmetên li ser wî girtiye siyasî yê Kurd bê bingehe in, û tu belgeyek derheq hebûna pêwendiyên

wî digel Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê nine.

Komela Mafê Mirovan a Kurdistana Îranê-“Genev” di vê nameyê de, ev yeka jî erê kiriye ku, Hidayet Ebdullahpûr, bê sûc e, û ev heyama 78 rojan bû, di girtîgeha îdareya Îtîla`ata Spaha Pasdaran, li bajarê Urmiyê de bo wergirtina gotinên bi zorê, hatibû îşkencekirin.

Ferhad Ebdullahpûr, birayê wî girtiye siyasî yê Kurd, di gotûbêja digel Saziya Komela Mafê Mirovan a Kurdistana Îranê-“Genev” de, daye xuyakirin ku bi sedema îşkenceyên nemirovî yên hêzên îtîla`atê yên di girtîgehê de, her du guhên birayê wî ker bûne.

Roja Duşemî 16`ê Rezberê, taya 47 a Dîwana Bilind a dewletê, cezaya bidarvekirinê ya Hidayet Ebdullahpûr, girtiye siyasî yê



Kurd yê xelkê bajarê Şinoyê, pesend kiribû.

Hidayet Ebdullahpûr girtiye siyasî yê Kurd, roja Pêncşemî 28`ê Rezbera 1396`an, bo cara duyem di dadgeha Şoreş a bajarê Urmiyê de, hate dadgehîkirin û navbirî bi tawana “alîkarîkirina digel yek ji partiyên Kurd yên opozisyona hikûmeta Îranê”, dîsan cezaya îdamê jê re hate birîn.

Hidayet Ebdullahpûr, di yekem civîna dadgehê ya ku tenê di demeke kurt de bi rê ve çûbû, cezaya bidarvekirinê jê re hatibû birîn, û di dema lêkolînê de jî, ji mafê hebûna parêzerê bê par bûye.

“Denmark”ê Balyozê xwe yê li Tehranê vexwand



kiryarên terorîstî di wî welatî de bûye, “Anders Samuelsen” Wezîrê Karê Derve yê “Denmark”ê ragehand ku, tevî gazîkirina balyozê Îranê, wan balyozê xwe jî ji Tehranê vexwandîye.

“Anders Samuelsen” gotiye ku: Komara Îslamî li pey encamdana kiryarên terorîstî bûye di nav axa “Danmark”ê de, û li gorî gotina navbirî dezgehên teroîstî yên Komara Îslamî xwastine da ku êrîşê bikne ser berpirsekî Tevgera Ereba Azadîxwaz a El-Ehwazê ku, di wî welatî de jiyane dîke .

Herwisa li ser rûpela “twitter” a xwe jî nivîsiye ku, “ew kirya Îranê nayê qebûlîkirin, û welatê “Denmark”ê bersîvek guncav li hemberî Îranê de wê hebe, û her di vê derheqê de digel welatên din jî wê gotûbêjan encam bide.

Ew helwêsta welatê “Denmark”ê, digel piştewaniya Amerîkayê rûbirû bûye. “Mike Pompeo” di peyameke “twitter”î de ragehandiye ku: “Em destxweşiyê li dewleta “Denmark”ê dikin, ji ber helwêstgirtina bivêrane, û heriwsa gotiye jî; “Ew nêzkî 40 salan e ku Ewropa bûye armanca pîlanên terorîstî yên Îranê, û berdewam daxwaza me ji hevalbendan ew bûye ku, hekî bo parastina ewlehî û aramiya cîhanê jî bibê, li hemberî Îranê de bisekinin.

Ewa cara çendê ye ku, komara Îslamî di nav axa Ewropayê de, hewlên encamdana kiryarên terorîstî yên bi wî rengî dide, ku kiryarên herî berçav terora “Viena” û “Mykonos” bûn, ku mixabin her du ji wan serkevtî bûn, û tê de du rêberên mezin yên gelê Kurd hatine şehîdkirin.

Hevdem digel gazîkirina balyozê Komara Îslamî ji “Copenhagen” a, “Denmark”ê, dewleta “Denmark”ê balyozê xwe jî li Tehranê, bi sebeba hewlên terorîstî yên komara Îslamî di wî welatî de vexwand.

Paş vê ku berpirsên ewlekariyê yên “Denmark”ê ragehandin ku, Komara Îslamî li pey encamdana

Endamekî Hizba Demokrat pileya yekem a zanîngeha Kurdistanê bi dest anî

Di beşa zanistî de, endamekî Hizba Demokrata Kurdistanê Îranê akinciyê herêma Kurdistanê, xwandekarê zanîngeha polîteknîk, karî pileya yekem bi dest bîne.

“Sasan Ye`îqûbî” endamekî Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê, kurê “Muhemed Ye`îqûbî” kes-ayetiyeke naskirî ê devera Selasî

Bawecanî û Ciwanro ye, di warê tendirustiyê de li zanîngeha polîteknîk a Silêmaniyê pileya yekem bi dest anî.

Ew endamê Hizba Demokrat di rêûresma derketin ji zanîngehê, ji aliyê serokê zanîngeha polîteknîk a Silêmanî ve bawernameya bekaloryosê bi wî hate bexşîn.

“Sasan Ye`îqûbî” pêştir jî ji aliyê “Qubad Talebanî” cêhgirê serokê Herêma Kurdistanê vê hatibû xelatkirin.



Rewşa jiyanê xelkê Îranê bi sedema zêdebûna dem bi demê ya nirxa hewcehiyên rojane, dijvartir dibe


Piştî sepandina gera 2`yan ya dorpêçan ji aliyê Amerîkayê ve bi ser Îranê de, roj bi rojê bêtir nirxa hewcehiyên rojane yê jiyanê xelkê li bazarên Îranê de diçe serê, ku ev yek jî bûye sedemê vê ku rewşa jiyanê xelkê dijvartir bibe.

Ji havîna îsal ve nirxa pareke berçav ji hewcehiyan du beranber ji berê zêdetir bûye, bi taybet nirxa

hewcehiyên xwarinê du caran zêdetir buye. Pîraniya xelkê bi vê sedemê şiyana kirîn û dabînkirina hewcehiyên xwe çininin.

Zêdebûna nirxan bûye sebeb ku bazar kesad be, û astê firoşê jî kêmtir be.

Wa tê pêşbînîkirin ku li rojên dahatî de, nirxa bazarê û hewcehiyê rojane yê xelkê jî wê hindê jî zêdetir be.



Ferhenga Peyvan ya navê giyayan bi zimanê Kurdî hate çap û belavkirin

Ferhenga Peyvan ya navê giyayan bi zimanê Kurdî, piştî 14 salan hewl û têkoşana bê hempa li bajarê Mardîn a Kurdistanê Turîkiyê, hate çap û belavkirin.

Ferhenga Peyvan ya navê giyayan bi zimanê Kurdî, piştî 14 salan zehmet û têkoşana bê navber û komkirina navên Kurdî yê 20 hezar giyayî, ji aliyê “Ehmed Qasim Uxlû”, li bajarê Mardîn a Kurdistanê Turîkiyê, hate belavkirin.



Wî endazyarê çandinyê yê xanenişin 14 salan berî niha, komkirina navên Kurdî yê giyayan bi taybet giyayên ku di Kurdistanê de çê dibin, dest pê kiribû.

“Ehmed Qasim Uxlû”, bi îmkantên şexsî û herwisa bi alîkariya çend “perfessor”ên zanîngeha Dicle, dest bi komkirina navên Kurdî yê giyayan kiriye.

Piştî bidawîhatina navên Kurdî yê giyayan, ev ferhenga Peyvan bi alîkariya “Qadir Yêldrim”, li zanîngeha “Artuklu” a bajarê Mardînê, hate çap û belavkiriye.

Zêdebûna nirxa hewcehiyên rojane givaşeke zêde xistiye ser xelkê

Rewşa jiyanê xelkê Îranê bi sedema zêdebûna dem bi demê ya nirxa hewcehiyên rojane, dijvartir dibe.

Piştî sepandina gera 2`yan ya dorpêçan ji aliyê Amerîkayê ve bi ser Îranê de, roj bi rojê bêtir nirxa hewcehiyên rojane yê jiyanê xelkê li bazarên Îranê de diçe serê, ku ev yek jî bûye sedemê vê ku rewşa jiyanê xelkê dijvartir bibe.


Ji havîna îsal ve nirxa pareke berçav ji hewcehiyan du beranber ji berê zêdetir bûye, bi taybet nirxa hewcehiyên xwarinê du caran zêdetir buye. Pîraniya xelkê bi vê sedemê şiyana kirîn û dabînkirina hewcehiyên xwe çininin.

Zêdebûna nirxan bûye sebeb ku bazar kesad be, û astê firoşê jî kêmtir be.

Wa tê pêşbînîkirin ku li rojên dahatî de, nirxa bazarê û hewcehiyê rojane yê xelkê jî wê hindê jî zêdetir be.



Rejîma Îranê mamostayan dişîne nav “nexweşên derûnî” de



Karmendeke nexweşxaneyêke Meşhedê ragehand ku Haşim Xastar çalakê pîşeyî anîne nexweşxaneyê, û renga derzî lê dabîn.

Sidîqe Melikî derheq destbiserkirina hevjinê xwe ragehandiye ku: Sîbezûya roja Sêşemiyê dema ku ew ji mal derket, piştî ez jê bêxeber bûm. Piştî tirombêla wî li cihekî din li dervey Meşhedê hate dîtin. Hevjinê min ji aliyê îtila'ata Spaha Pasdaran ve hatibû girtin, û bi bêtir sedemê ew ji roja Sêşemiyê ve biribûn nexweşxaneyê rewanpizişkî ya “Ibn Sîna” ya Meşhedê ku taybet bû bi kêşeyên derûnî.

Çend rojên borî ku navbirî bêsêrûşûn bibû, hinek ji karberên torên civakî bêsêrûşûnkirina wî digel bêsêrûşûnkirina Xaşi'îş didane ber hev.

Di hefteyên borî de gireva mamostayan yek ji nûçeyên herî girîng di torên civakî de bû. Destpêkê ragehandinan gellek guh nedane vê bûyerê, lê piştî ew girev dirêjî kêşa, û dersxwanan jî piştigirîya vê girevê kirin. Hevjîna navbirî herwisa ragehandiye: “Roja Pêncşemiyê min pê re hevdtin pêk anî. Di vê hevdtinê de wezîfedarên emniyetî nehêlan ku ez digel hevjinê xwe ji bilî halpîrsînê tu pîrsek din jê bikim. Herwisa wan wezîfedaran bi min ragehandin ku dibe li gora helwestên wî, em wî test bikin ku gelo ew tewaw e yan na”.

Nexweşxaneyê Kehrîzekê herifî û çend kes mirin

Hiloşîna dîwarê nexweşxaneyekê li Kehrîzekê canê çend kedkaran girt, û çend kes jî birîndar bûn.

Hiloşîna dîwarê nexweşxaneyêke Xêrxwaziyê di Kehrîzeka başûra Tehranê de, ku di halê çêkirinê de bû, bû sedema mirina pênc kedkaran, û birîndarbûna çend kesên din.

Husên Kitabdar birêveberê Rêkxirawa Heyva Sor a Tehranê, bas ji mirina pênc kesên di vê bûyerê de kiriye.

Zêdetirîn serjimêriya bûyerên kar di Îranê de, vedigere bo kedkarên ku di avahiyan de kar dikin. Karnas dibêjin zêdetir ji %50 ji bûyerên kar di avahiyan de rû didin. Bi baweriya wan, %85 a bûyerên kar, bi sedemên mirovî, û bi sedema çavdêriya xirab di cihê kar de rû didin.

Di bin deshilatdariya rejîma dijîgelî ya Îranê de, gellek zehmet e ku pêşiya rûdanên weha bihê girtin, jiber ku ew tenê û tenê di bîr û hizra parastina deshilata xwe ya nerewa de ne, û tu xema wan nîne ku rojane ew qas bûyerên kar di welêt de rû bidin.



Dermanên derekî ên şîmîdermaniyê nahêne bîmekirin

Wezareta Tendirustiyê a rejîma Îranê, dermanên derekî ên taybet bi şîmîdermaniyê di lîsta bîme de reş kiriye.

Wezareta Tendirustiyê reşkirina navê dermanên taybet bi şîmîdermaniyê ji lîsta dermanan de bi kiriyarek ji bo piştevanîkirin ji berhevanîna navxweyî nav biriye.

Ev wezareta rejîma Îranê li Cozerdana îsal de piştî daketina yekcarî a nirxa erz, ragehandibû: Anîna dermanan bi nirxa erz a 4200 Tûmenî tê dabînkirin û cihê nîgeraniyê ninê, û derheq bi vêdebirina wan dermanane ji lîsta dermanên xwedîbîme “Resûl Xizirî” endamê Komisyona Civakî a meclisa rejîmê nîgeraniya xwe ji vê kiryarê nîşan da, û got:

“Ev rewşa tendirustî û nexweş ên tûşbûyî bi şêrpence û herwisa ew kesên ku çareserîya şîmîdermanî bo wan tê kirin, di gel metirsiya micid berbirû dibin.

Eva di halekê de ye ku dabînkirina dermanên derekî ên şîmîdermanî di mehên derbazbûyî de zehmet bûye, û bi sedema kêmbûna

hinek ji dermanan li dermanxaneyan de, nirxa wan jî zêde bûye.

Giranbûna nirxa dermanan û dabînkirin ji aliyê bîmeya dermanî ve, bûye sedema zêdebûna firotina wan dermanane li bazara reş de, ku ji bilî giranbûna nirxa wan, hinek cara bi sedema saxtebûnê ve canê nexweşan dixê metirsiyê de.




Xelata Seydayê Cegerxwîn a 2018 hat diyar kirin

Komîteya Xelata Cegerxwîn a Afirandinê xelata xwe ya îsal (2018) bi hevbeşî da zimanzanê Kurd ê naskirî Deham Ebdilfetah û lêkolînavanê Kurd Îbrahîm Îbrahîm.

Nivîskarê Kurd Fewaz Ebdê serkariya Komîteya Xelata Cegerxwîn a Afirandinê ya îsal 2018ê kir. Herwiha Ebdilsemed Dawûd û Hefîz Ebdilrehman endamên wê komîteyê bûn. Keça Seydayê Cegerxwîn Boniye Cegerxwîn jî wek çavdêra giştî ya xelatê bi rola xwe rabû.

Wergirê xelata Cegerxwîn di warê helbest û ziman de, zimanzanê Kurd Deham Ebdilfetah ji bajarê Amûdê yê Rojavayê Kurdistanê ye û niha li bajarê Êlih ê Batmana Bakurê Kurdistanê dijî.



Gelek berhemên Deham Ebdilfetah ên çapkirî di warê helbest û zimanê Kurdî de hene wek: Li Ber Dergehê Laleş, Nerîneke Rexneyî li Helbestên Kurdî,

Hindek Aloziyên Zimanê Kurdî, Rastnivîsa Zimanê Kurdî, Dastana Gilgamêş, Nav di Zimanê Kurdî de, Cînav di Zimanê Kurdî de, Kar/Lêker di Zimanê Kurdî de û

gelek berhemên din.

Wergirê xelata akademî ya Cegerxwîn lêkolînavanê Kurd Îbrahîm Îbrahîm ku xelat li ser berhema xwe ya bi navî “Rengvedana Dîroka Kûrdî di Helbestên Cegerxwîn de” wergirt di sala 1971ê de li bajarê Hesekê yê Rojavayê Kurdistanê ji dayik bû.

Di sala 1997an de li Zanîngeha Şamê di beşa dîrokê de lîsans wergirt. Di sala 2016an de lîsansa bilind (master) di beşa ziman û çanda Kurdî de li zanîngeha Mardînê wergirt û di heman salê de bû xwendekarê doktora di beşa ziman û çanda Kurdî de li Zanîngeha Dicleyê li Amedê. Îbrahîm Îbrahîm niha li Swêdê dijî. Rudaw

Nivîskara ji Rojhilatê Kurdistanê Meryem Qazî koça dawî kir



Nivîskara Kurd a Rojhilatê Kurdistanê Miryem Qazî li bajarê Mehabad koça dawî kir.

Xatûn Meryem Qazî ku ji malbata naskirî ya Qazî ye li Mihabadê û biraziya Pêşewa Qazî Mihemed e, di warên helbest, çîrok, wergêran û rexneyên edebî de çalak bû, gelek berhemên wê di rojname û govarên Başûr û Rojhilatê Kurdistanê de belav bûne.

Herwiha du kitêbên wê bi navên “Hatina Hundir Qedexe ye” û “Zindebegorî” anko “Bi Saxî Çalkirin” çap û belav

bûne û romanek jî bi navê “Min Jiyan Xweş Divê” di jêr capê de ye.

Meryem Qazî di heman demê de çalakvaneka aktîv a mafên jinan jî bû.

Meryem Qazî sala 1964-an li bajarê Mehabad ji dayîk bûbû û roja Duşembî 5-ê Mijdara 2018-an her li wî bajarî koça dawî kir.

Grûpa Dîlan, dîlana Kurdî vedijîne

Endamên grûpa Dîlan a Urmiyê dibêjin wan 45 cûreyên dîlanan ku berê li parêzgeha Urmiyê ya Rojhilatê Kurdistanê hebûn zindî kirine û dixwazin girûpên hunerî alîkariya wan bikin ji bo ku wê çandê biparêzin û ji bo nîşên dahatî jî bihêlin.

Desmala serçopî û kela bêrdûkê, wate çand û dîroka Kurd, li devera Urmiyê, yek ji kevintirîn hunerên Kurdî li yek ji kevintirîn cihên dîrokî yê berxwedana gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê.

Grûpa Dîlan a Urmiyê dixwaze ji bo zindîkirina çanda wê navçeyê, li her derekê bide û careke din ji xelkê navçeyê re bêje ku çand û

dîroka te çi bûye. Grûpa ku salek temenê wê ye, weke ew dibêjn, destkeftên wan ên baş hebûne.

Endamê Grûpa Dîlan Şehab Mûsayî dibêje, ku heta niha ji 67 listikên Kurdî, karîne 45 govend kirine.

Weke her kar û çalakiyeke din ya Rojhilatê Kurdistanê, Grûpa Dîlana Urmiyê jî bêtir astengî nîne. Tenê rêya ku ew dibînin ji bo alîkariyê jî, xelkê heman navçeyê ye ku ew destê alîkariyê ji wan re dirêj dikin.

Umîd Kerîmî ku ew jî endamekî grûpê ye diyar kir, ku ew ji xebatkarên çandî û hunerî dixwazin ku alîkariya wan bikin û daxwaza

wan jî ew e ku ciwanên Kurd beşdarî grûpa wan bibin.

Pirsgirêk her çi qasî zêde bin jî, dema ku dîlanvan germî dîlana xwe dibin, hemû hest û heşên wan li ser wê muzîkê ye ku wan diherkîne.

Muzîka hinek caran hemaseta berxwedanê û hereketên dîlanê yê mîrxasiyê diafirîne, hinek caran jî hestên evîni û xweşkiya çanda Kurdî nimayîş dike. Urhan Alan eşkere dike, armanca wan a sereke ji vê grûpê ew e ku govend û dîlana ku ber bi mirinê bûn, cardin vejînin. Muzîkek ku çavkaniya wê jinav dilê Kurd be, lîxistina wê bes e ku destên çand û huner û dîrok bide destê hev û dîlanvan jî bi wê hestê bigehe lûtkeya kelecane. Rudaw



Zimanê Kurdî

Balkêş e ku cînavên koma (ez) di çi hevokê de bikar bînin, ev kurtebêje (im, î, e, in) jî, li pey wan tên.

Wek : - (Ez im, tu yî, ew e, em in, hûn in, ew in)

- (Ez te dibînim, tû min dibînî, ew te dibîne ..)

Vê balkêşiyê kiriye ku şarezayên zimanê kurdî li ber van kurtebêjeyan (im, î, e, in) rawestin û pênasîna wan ronî bikin:

- Pro. Qenatê Kurdo dibêje, ew pirtik paşkokên nav û cînavan in, di raweyên dema rast (netewandî) de, li pey wan tên û rewşa heyîna wan diçespînin .

- Seyda Reşîdê Kurd wan dike cînavên dûmdar . - Feqî Huseyn Sagnîç jî di rêzimana xwe de ew kirine qertaf (paşpirtik) . - Min jî, di pirtûka xwe (Hindek Aloziyên Zimanê

Kurdî) de, li gora nêrîna Q.Kurdo, ew kirine paşkok . - Lê Celadet Bedirxan, Rojyê Lîsko, Kamîran Bedirxan, Sadiq Behadînê Amîdî ew kirine karê (bûn)ê di dema nuho de . Li gora baweriya min î nuho, ew navlêkirin û danasînên zimanzanan tev hêj cihê lêkolîn û pirsê ne. Gelek pirsîyar û têbînî derbarî wan di bîra me de digerin . Bi hêvî me ku ez karibim careke dîtir vê mijara aloz, (li gora têgihiştina xwe), vekolim .

2- Bi karên nederhingêv re : Cînavên koma (ez) bikarên nederhingêv (têneper) re di hemû dem û raweyan de bikar tên :

-Nimûne : (karê ketin-keftin)

- Dema bûrî:

- Ez ketim, ketime, diketim, ketibûm,
- Tu ketî, ketiye, diketî, ketibûyî
- Ew ket, ketiye, diket, ketibû
- Em ketin, ketine, diketin, ketibûn.
- Hûn ketin, ketine, diketin, ketibûn.
- Ew ketin, ketine, diketin, ketibûn.

- Dema nuho :

- Ez dikevim, tu dikevî, ew dikeve, em dikevin, hûn dikevin, ew dikevin.

- Dema paşeroj :

- Ez ê bikevim, tu yê bikevî,
- Ew ê bikeve, em ê bikevin, hûn ê bikevin, ew ê bikevin.

- Raweya fermanî :

- Bikeve (tu).
- Bikevin (hûn).

- Raweyên daxwazî :

- Xwezî ez bikevim, tu bikevî, ew bikeve, em bikevin, hûn bikevin, ew bikevin.



Çavê çekdarên li Efrînê, li ser zeytûnên Kurdan e

Ji aliyekî ve Tir-kiye berdewam e li ser gefên li Rojavaya Kurdistanê, û bi taybetî rojhilata çemê Furatê, û ji aliyekî din ve jî hêzên deshilatdar li Efrînê berdewam diziyê dikin, û eziyeta xelkê dikin, û ciwanan direvînin û îşkence dikin û pere ji wan distînin.

Li gora zanyariyan, mînên çandî li ser riyan li efrînê, berdewam dibin sedema qurbanîbûna xelkê sivîl. Roja Duşemiyê mîneke çandî li ser riya gundê “Goliya Jorîn” di bin teraktora hevvelatîyekî sivîl de teqîya û xwediyê

wê teraktorê yê bi navê Elî Beşîr jiyana xwe ji dest da. Herwisa birayekî wî jî her du piyên xwe ji dest dan. Wan dixwast herin nav baxên xwe ên zeytûnan de. Çete û girûpên di Efrînê de, bixwe ji bo cotkaran diyarî dikin ku berhemên xwe bifroşin çî aliyekî. Niha jî bo firotina zeytona wan biryarên nû derxistîne.

Fermade Mihemed Casim fermandarê girûpa bi navê Sultan Silêman li bajarokê Şiyê berdewam e li ser zilma li xelkê Efrînê. Wî biryar daye ku %10-%35 ji dahata barên zeytûnan li gora rêzbenda ku wan diyarî kirine, ji



xelkê wergirin. Herwisa ew her tenîkeyeke wala bi 800 Lîreyên Sûrî difroşin Kurdan, û serê her tenîkeyekê 50 Lîreyan ji xwe re dirakin.

Roja borî jî wan çekdaran, mala pîrejinekê li Efrînê talan kirin, û piştîre agir berdane mala wî. Ew zilma ku li xelkê Efrînê dikin, mixabin bi bédengî derbaz dibe, û kes bi hawara xelkê vê herêmê de nahê.

Tehran di rêza bajarên herî pîs ên cîhanê de ye



Ajansa Jîngehparêziya Ewropayê bas ji pîsbûna hewayê Tehranê kiriye.

Li gora ajansa “Euronews”ê, Ajansa Jîngehparêziya Ewropayê di rapora salane ya xwe de rêzbandeke nû ji bajarên herî pîs ên cîhanê amade kir.

Li gora vê rêzbandê, Tehran piştî “Çakarta”ya paytexta “Endoneziyê” bajarê herî pîs ê cîhanê ye.

Li gora vê raporê hewayê Tehranê bi awayekî navgîn di

nava her metra sêca de 72 mîkrogirem mewadên pîs û nepaqîj tê de hene. Li gora destpêkirina demsala sîrr û seqemê, û diyardeya “Înorjîn”ê, akinciyên paytext cardin bêguman wê şahidê rojên pîs û nepaqîj bin, ku di salên borî de, dewlet çend caran neçar bûye bi daxistina xwendingehan. Hinek ji berpirsan di Îranê de dibêjin ku tirombêlên têkçûyî sedema serekî ya pîsbûna hewayê Tehranê ne. Lê her ew berpirs tenê daxivin û dema ku hewce ye ku di piraktîkê de, kar bo nehêlana van kêşeyan bê kirin, xelk tu kiryarekî wisa ji wan berpirsan nabînin.

Xwêya gola Urmîyê, Tevrêzê jî dixê bin bandora xwe de

Dema ku bayek radibe, xwêya gola Urmîyê heya Tevrêzê û derdora wê jî diçe.

Alîkarê Îdareya Giştî ya Jîngehparêziya Azerbaycana Rojava ragehandiye: Tevrêz û bajarên derdora wê di dema rabûna ba de, dikevin bin bandora hûrkên xwê de.

Hesen Ebasînîjad
Alîkarê Îdareya Giştî ya Jîngehparêziya Azerbaycana Rojava di kombûna eşkere ya Şêvra Bajarê

Tehranê de ragehand: Pêştir binê gola Urmîyê wekî tasîkê bû, lê niha wekî devriyê lê hatiye, û bi bayekî kêr jî, hûrkên xwê radibin, û dibin sedema têkçûna jîngeha bajarên derdorê.

Gola Urmîyê bi rûberê 6 hezar kîlometirên çargoşe (50 hezar hîktaran), gola herî mezin a Îranê û duyemîn gola sûr a cîhanê, xemla Kurdistanê û bûka Urmîyê ye ku xwediyê gelek taybetmendîyan e. Ew gol bi 102 giravan ku

hemû jî ji aliyê Rêxistina unsco ve weke mîratê surûştî ên cîhanê hatine nasîn, bûye bi şacuwana deryayan û têde çendîn corên teyr û teval, candar û kirmika herî giran û binav û deng ya Artimya dijîn.

gola Urmîyê ku yek ji mîratên herî kevnar, bedev û dîrokî yên Kurdistan û Îranê ye, niha li rewşek pir kirîz de dijî û nefesên dawîn ên xwe hildikişîne. Anku demên xatirxwastîna wê hatiye! malaway-

iyek ku li derveyî îrade û xwasta qeder û çarenivîsê ye. Bi giştî niha sedemên destçêkirî (mirovî) û xwezayî dest dane hev heya ku em bibin şahidê vê bûyera tirajidîk û ri-jyana çirayê bextê stêrak û nigîna bedev a Kurdistan û Îranê heya çend salên din.

Hişîkbûna gola Urmîyê de ekosîstema deverên derdorê jî tevlihev û têk bide û seqa û atmosfera hênîk û nerm a deverê wê bi seqayek germ û hişk tevî ba

û bahoza xwê biguherîne. Bi baldan bi aliyên cur bi cure wê tehlûkeyê, gefek netewî û cîhanî li rojevê de ye.

Wate ne tenê jîngeha Îranê, belkî ya gelek welatên cîran weke Ermenistan, Komara Azerbaycan, Îraq, Turkiye û ...hwd jî digre û dibe sedema koçbarbûna bi milyonan kesan û xetera tûşbûna bi Penceşêr û nesaxiyên din zêde bike.